


# NAMEYÊN DAWÎ YÊN SERPÎL POLAT

15 Şubat  
Komplosuna

17 Şubat Cevabı  
Serpil Polat



## NAMEYÊN DAWÎ YÊN SERPÎL POLAT...

" Rêhevalino;

**Dema ku ez we bi gerbûna pêvajoyê, di hêza rewşa we heyî ya xweser a bêkêmasî de, bi coşa me ya serkeftinê, di êgir de xwe ji silavkirinê re amade dikim, dixwazim deng bidim. Ji we hemûyan re di meşa me ya pêşengtiyê de demên tije jiyan kirinê dixwazim.**

Dengê min weke tê xwestin ne bihêz e. Ji ber ku biçekên me di lûtkeya çiyayên me de, ez li ne benda dema ku cihê xwe di nav yekîneyên gerîla de bigrim. Ez ne li bendê me ku di qadan de bi dijmin re singasing şer bikim, di nava çalekiyên ku xwediyê nîzama kedxwarî û zilmê, bavên pereyan di cihê xwe de direcifîne de bim; biçînî di kargeran de, di qadan de strana bibêjim, govendê bigrim; di nava xebatên ku rêhevaltiya bi rêber Mahîr re mezin bike, bi stratejiya şerê leşkerî ya polîtîkbûye re derbasî jiyanê dike de bim û gelek tiştên din bim. Di nava xwe de rewşeke binakoke.

Encax dema em li bersiva ku ji êrîşên li ser rêberên şoreşger dinêrin, di dîroka me

de, li Kizildereyê hatiye afirandin; li hemberî êrîşa li ser pêşengên şoreşger rêheval Denîz, Yûsûf û Hûseyîn destaneke berxwedêr a birumet dibe mînak.

Ez nakim wekhev, mafê min vê nîne. Lê belê di şert û mercên ku ez tê de me dijmin şewitandin, li hemberî êrîşê şer di xwe de mezin bikim, ev rêyeke bi êgir e.

Ez ne li benda hûn min fambikin û hemêz bikin. Di serkeftinê de kîlîtbûna me, dema rêyên şoreşê yên asê û zîvonek derbas dikin, ez jî dixwazim ala rizgariya şoreşgerî hildim.

Ji sorbûna berbanga ku nayê darizandin, parçeyekî sorbûnê bidin, li lûtkeya çiya belavbikin, ji kaniya zozanan qûrtek av di kolanan de kenên zarokan, dayikên semiyê yên dilê xwe bihezkirinê tije, mezinbûna rêhevaliyê li çadirên girêvê gerbûna dostaniya çînê, çiqas ez layiqbim bidin min.

Ez dixwazim bibim endameke ku şerê me yên pêşeng ên hevsengiya sînî parçe dike. Tevahî dibe bersiva daxwaza min a di xeta partî-eniyê de mezinbûna nasmameya min a rêxistinî. Weke ber endama yekîneya propagandaya biçek a Marksîst-Lenînîst, ez di wê baweriyê de me ku min ev endamtî maf nekiriye.

Êrîşên emperyalîzm, olîgarşiyên di şexsê rêberê şoreşger Ebdullah Ocelan di giştî gelan de, bitaybet li ser gelê kurd şermezar dikim, diyar dikim ku rêberê şoreşger Ebdullah Ocelan nikare were darizandin, mezinbûna hêrsa xwe bi agirê bedena xwe, amadekirina verişandina dijmin sergihayî dikim.

Rêhevalino, min zeman û dema xwe vegotinê bi dest nexist. Encax bawerîya min ez ê werim famkirin tam e, we û tevahî dostan bi rûmeta xwe ya şoreşgerî careke din silav dikim.

- Rêberê şoreşger nayê darizandin!
- Bila serokê giştî yê PKKê were berdan:
- Bimire olîgarşî bijî rizgariya şoreşgerî.
- Bimire emperyalîzim!
- Bimire faşîzim, bijî têkoşîna me!
- Bijî yekîneya propogandaya biçek a marksîst-Lenînîst!

Silavên şoreşgerî

Serpîl Polat 17.02.1999.

Ji gelê me û malbata min re

Ezê ji we re dirêj nenivîsînim. Hêvîdar im hûn ji ber vê yekê aciz nebin. Tenê dixwazim vê vebêjim.

Di şerê gel ê bi maf û rewa teqez dê bigihê serkeftinê. Bi daxwaza rûmeta meşa bi partî, eniyê re coşa silavkirina we dijîm. Di coşa vê rûmetê de, bi êgir ez ê hêrsa xwe ya dijmin verêşim. Divê em şerê ku emperyalîzim, olîgarşiya Tirkiyê di xwîna rijandinê de bîn xeniqandin, bilind bikin.

Di riya bi navê gelan derketinê de hewil didim bê dudilî meşa we bi dest bixim.

Em her tim bi hev re ne. Ev cudabûnek nîne, berovajî hevdîtin e. Îradeya şoreşgerî DGM(Dadgehên dewletê yên ewlekarî) yên olîgarşiya Tirkiyê, hêzên emperyalîst nikarin darizînin. Îradeya şoreşgerî nikare were teslîmkirin. Di rastiya vê rastekê de, ji ber tengbûna qada ez tê de, weke amûrê êrîşê xweşewitandin na, amûrê şewitandina dijmin bi kar tînim. Ez hêvîdar im hûnê vê biferaset pêşwazî bikin. Hezkirina min ji we re gelekî mezin e. Ez bawer im hûn ê ji daxwaza min a rêhevaltiya we re, bi famkirina min bersiv bidin. Ez tîm destê dayîk û bavê xwe. Ez we bi germbûna agir û rojê silav û hembêz dikim. Qet xemgîn nebin.

Min got jî ev ne veqetîn e, berovajî hevdîtin e. Hedîtina min bi we re tenê rawestgeheke hevdîtinê ya bi bedenê biçûk dixebitin bi kazanên pola li Alî Axa Petkîmê tê kuştin û bi karkerên Petkîmê yên her tim xeteriya mirinê dijîn bi şerê îrade û rizgariyê yê gerîlayê kurdistanê, şoreşgerên cîhanê û şehîdên şoreşê ye.

Em ê gelek caran hev bibînin. Li çiyana, li kolanan, li pevçûnan, barîkatan, dawiyê li stranên serkeftinê yên jiyana nû a mirovê nû afirandiye dê hevdîtin were kirin.

Li şûna ku agir bi bedena bikevin, bi bilindkirina şer, beden fedayî meşa serkeftinê bi serkeftinê bidawîkirinê be.

Ez dixwazim dostên PKKyê bibihîzin, vê çalakiyê bi daxwaza bidawîkirinê min xwe şewitand. Ez bi gotina em hevgirtina şoreşgerî bilind bikin, we hemûyan silav dikim. Şoreş bi gelbûnê digihên serkeftinê. Rola rêberên şoreşger girîng û jiyaniye. Rêberê şoreşger Ebdullah Ocelan dê bi vê zanîna tev bigere, divê tev bigere.

Dema ku rêber hatin tunekirin an jî ji xetê hatin derxistin, rêberên nû hatine afirandin, dê werin afirandin.

Jiyan û şer dê bi hev re were destgirtin, bi nirxandinê re meş didome.

- Ez tevahî şoreşgerên cîhanê silav dikim!
- Bimire faşîzim, bijî têkoşîna me!
- Bijî şerê leşkerî yê polîtîkbûyî.
- Bijî yekîneya propagandaya biçek a marksîst-Lenînîst.

Serpîl Polat

Ji xwişka min a can û xwarziyên min re;

Xwişkê beriya vê min ji zarokan name girt, gelekî xweşik nivîsîne. Wêneyên Dîloş gelek xweş derketiye. Dema min we di wêneyê de dikene dît, dilê min kenand. Li xwe û zarokan baş binêre.

Ez silav û hezkirinên xwe ji zava ( enîşte) re dişînim. Ez bawer im tu weke kevin hestiyar î. Ev gelekî ne xirab e jî. Dema ku rê nîşanî hestên xwe bidî, hîn zêdetir bi mantiq, teşedandina hestên xwe bi ser bixî, tê cuda bibî, bilind bibî, hîn tê bibî mirovê ku bê hezkirin.

Yanê ya bibêjim, destûr nede hestên xwe te zêde ji taqet bixin. Bifikire, wate bide yên tên jiyankirin û yên dê werin jiyankirin. Em neçar in siberoj çawa gav bi gav tê hunandin bibîn û fêhm bikin. Em neçar in li gorî hêz û hebûna xwe xwedî li siberoja zarokên xwe derkevin.

Ev pevçûn; pevçûna dawî lê anîna li evqas nebaşiyên tunekirina kedxwarî û zilmê ye. Di şerê şoreşgerî de, hewildana ku dikeve ser wê/î bicihanînê.

Ya me Ji kizilderiyê ve yên hatine afirandin bi rûmetî dane ser mil û pêş ve birin û ala ku şehîdên şoreşê hiştine parastin, zelalbûna şerê li qelaya serkeftinê hilda ne...

Di vê rastekê de min coşa berpirsiyariyên xwe pêkanînê jiyan kir. Min ji jiyane hez kir, min ji jiyana di zarokan de hez kir. Di çavên gerîlaya Helkiz ya ji Timokê( navê gund) de, min ji tiliyên Helkiza min ku bi sehra çardehsaliyê pê li tetîkê dike hez kir.

Îroj, bi navê siberojên zarokan, di xweşikbûna bêdawîkirina evîna vê jiyane de ne. Dê xweşikbûn bibin ên me, siberoj bibe yê gelê me, çînê û gedeyên me.

Nikarim dirêj binivîsim, min biborîne. Ji nasan û cîranan re hezkirinên min ragihîne. Malbata şîrîn û bebeka biçûk a reşik a di wêneyê ku fîdan bi rê kiribû de silav dikim.

Wêne, hevgirtina gelan nîşan dide.

Bi jinekê re gopal hebû. Diyar e yeke nexweş e. Dibêjim; derbasbûyî be. Silavên min ji dayîk, bav, keçan, zeyneb, Aynûr û her kesê/î re bibêje.

Bi hezkirinê re

Serpîl

Fîdana Xoşewîst;

Ez dizanim ji bo min kin nivîsand tu dê aciz bibî, encax bawer bike ku, ji nav karên din dem didizim û ji bo hezkirina xwe ji te re vebêjim ji te re dinivîsînim. Min nameya te eciband. Min li ser ciwan û erkên wan bi te re yek bi yek nîqaş nekiribe jî bawer im vedibêjim. Her min got ciwan; tu çiqas wiha mezin bûyî lê belê min bawer dikir ku hîn tu zarok î. Lê tê çî bikî, niha wiha ez dibînim ku nebûme çavdêrê baş jî...

Can Roşem, endezyara min a kar Çûrem; li xwe, xwişk û birayên xwe û hevalên xwe baş binêre, berê xwe bide giravê. Ji giraviyan û berbangên re dest bihejîne. Di dema berbangê de ji sorbûnê re bikene. Xaltîka te ya her tim ji te hez dikir û dê hez bike.

Fîgena me;

Selhildêr û dil dîna min.

Dîsa min bi gotinên te yên xweşik û nas dengê te bihîst. Stranên ku te digot hate bîra min. Dema tu mezin bibî, bê hevdeha xwe, em ji bo tu êş û êşkenceyan negirîn derketin rêçikan. Heke derbasbûna ji riyên asî û binar bikeve ser te, bila serê te bilind, dengê te weke daristanan gur be. Niha ev her tiştên mezin in. Ji kêmasîkirinê netirise. Ji hevalên xwe gelekî hez bike. Li parkan heta ku têr bibî bileyize. Ez dixwazim lîstokeke berê bi te re lîstim, bileyizim. Lîstoka birê tu bixwazî vebêjim. Ev lîstokeke şer e, ya taktîk pêş dixwe. Em darekî bi erdê çiqînin. Em du koman wekhev çêbikin. Koma yekemîn dema dixwaze darê çiqandî bi dest bixe, koma din wî diparêze. Koma dar diparêze parastin, ya dixwaze bigire

êrîş e. Ên di parastinê de jî bi hemleyan dikarin êrîş bikin. Her du kom jî bi girtina hev an jî di navbera du kesên koma hember derbas dibe û dixwaze hejmarê kêmbike. Heke êrîş darê çiqandî bi dest bixe, serkeftin a wan e. Encax heke parastin taktîkê pêş bixe bi şewitandina endamên koma din re dikare serkeftinê bi dest bixe. Min lîstokê tam kitekit nekir. Tu dixwazî ji yên ku dizane fêr bibe û bileyize. Lîstokeke bi zewq e. Ji bo ku ezê ji Dîlan, Denîz binivîsim li vê derê xelas dikim. Ez te heta bes hembêz dikim û maç dikim.

Dîlan û Denîz

Wêneyên ku we xêz kir gelekî xweşik bûn. Ez gelekî kêf xweş bûm. Heke we yê hîn xweşiktir xêz kir, dîsa ji me re bişînin. Dîlan, min jî gelekî bêriya te kiriye. Tu dixwazî ez werim, ji xwe ez li gel te me. Wêneyê te bi cilên bûkanî gelekî xweşik derketibû. Min tu li gel xwe dît. Tu dizanî, tu qet nedigirî. Qet negirî. Xwişkên xwe xemgîn neke. Li Denîzê baş binêre. Denîz, tu jî bi zarokên li wir baş li hev bike. Ew ji te hez dikin. Tu jî ji wan hez bike. Bebek a di wir de li şûna min maç bike.

Yên min nivîsand, vegot dê werin vegotin. Ez ji we hemûyan hez dikim. Li xwe baş binêrin.

Silav û rêzên şoreşgerî

Serpîl

..... Heval

Ez dixwazim van nîşeyên min ên ku bi lez hatine nivîsîn tu biparêzî û bigihîni cihê wan.

Di şexsê rêhevalê min ..... de silavên min ji tevahî rêhevalan re ragihîne. Min ji we hez kir û ez ê hez bikim jî. Ez tîm destê dayîka te. Baş li keça min Guler, tevahî ahaliyê koxûşê binêrin. Ez li di berxwedana zîندان de bi we re me. Destên min ên li hejdehan li şûna min hembêz bike. Kamîle, Mûslûm, S.Alî û tevahî dostên min ên ku min dem nedît rêz bikim hembêz dikim, serkeftinê dixwazim.

Li derve birayekî min ku nabîne heye. Ez dixwazim ew bizanibe ku min ew ji bîr nekiriye. Hêvîdar im dê vê helwesta min fam bike.

Silavên şoreşgerî

Serpîl

Seat 04:20

Nîşe: ez peyama ku xwişk û birayên min xemgîn nebin, meşê bihêz bikin didim.

**Bijî Yekîneya Propogandaya Biçek a Marksîst-Lenînîst**

17 Şubat 2009